

## Nûçe û Çalakî

### Xebatkare Kurd ê navdar Nesredînê Birhik hate kuştin!

Piştî nîvro a roja Duşembê 13ê Sibate, kesine çekdar û ne diyar, li devera Aliyan, navçeya Çelaxa, hovîti û zikreşiya xwe nîşan dan û 13 gule berdane tirumpêla birêz Nesredînê Birhik, du guleyan bi kûrî ew birîn kirin. Berbanga roja Çarşembê 22ê Sibate, li nexweşaneyê bajare Helebê, jiyana xwe ji dest dide û diçe ber dilovaniya Xwedê.

Li gundê Kevirê Dena devera Aliyan sala 1960î kek Nesredîn ji dayik dibe, xwendina xwe li bajarokê Çelaxa diqedîne û paşê diçe Dêra Zorê, li wir du salan li peymangeha pîşesaziyê- beşê kehrebê dixwîne û wê jî diqedîne. Birêz Bavê Alaa, tevî rêzên partî dibe û sala 1988an dibe endamê komîta navendî. Weke mirovekî comerd, cegerdar û dilsoz di nava hevalên xwe de tê naskirin. Di hemû çalakiyên cemawerî de, nemaze di bûyerên sala 2004an de, ew serkêşiya gelek xwepêşandanên dike û weke xebatkarekî kurdî cemawerî li deverê û herêmê bi tevî tê naskirin.

Roja 22ê Sibate, bi dehên hezaran kes ji welatparêzên Kurd û tevgera siyasî û ciwanên Kurd û çalakvan bi darbesta wî re kar bûn û pê re çûne gundê wî. Li Qamişlo, Tirbespiyê û Çelaxa, li gundên derdora riya Dêrikê, xelkên kurd li hêviya hatina darbesta wî man da ku terorkirina wî protesto bikin û xatirê dawî jê bixwazin. Demjimêr 6ê êvarî, li gundê Kevirê Dena bi beşdariya 10 hizar mirov hate veşartin, wan:



## Nûçe û Çalakî

gelek gotin û helbest li ser hatin xwendin, ji gotina Encûmena Niştimanî Kurdî Li Sûriyê û gotina parta wî ji bal birêz Behzad Dorsin ve hate xwendin.

Bila cihê pakrewanê me buhuşt be û serê malbata wî, hevalên wî û gelê kurd sax be. Bi vê bûneya diltezîn, komîteya NEWROZê, bîhînameya jêrîn ji partî û malbata pakrewan re şandibû, ev e deqa wê ye:

### Behîname

Birayên hêja, dost û hevalên P.D.K.S  
Malbata pakrewan Nesredînê Birhik...

Di baweriya seqet a hov, zikreş û kujeran de, tund û tûjî, lêdan, girtin û kuştina mirovan dikarin ji dozên rewa re bibine derman û çareserî... Ji wan weye ku, bi van karên xwe yên kirêt û gemar, wê karibin gelê me çavtirsandî bikin, rê li ber çareserkirina doza wî ya dadmend û rewa bigrin.

Lê belê, ew texmîn û boçûnên wan şaş in, ji ber ezmûnên gelan teqez kirine ku kuştin û terorkirina xebatkaran, xebata netewî gurtir û yekîtiya hêzên gelan xurtir dike. Bila kujerên destbixwîn zanibin ku, qurşîn û guleyên wan nikarin me ji doza gelê me dûr bikin û baweriya me bi jiyaneke azad û aştiane qels bikin.

Di vê şîn û behiyê de, di komîta rojnameya NEWROZ a bi zimanê Kurdî de, em xwe xembar û hevpişkê derd û êşa we dibînin.

- Serê gelê me yê Kurd sax be!
- Serbilindî ji pakrewanê Kurd Nesredînê Birhik û hemî pakrewanên şoreşa Sûriyê re!

24.02.2012

Weşana NEWROZ